



Jane,  
Kirêkar a dikanê



Abdoulie,  
Kirêkar a embarê

**Bi hev re  
bi hêz in**

# Tu ferq dikî

**Wek endam tu li nik me hertim di navendê de yî. Em bi hev re alîkarî dikin û dibînin ku endametî ji bo te û ji hevalên te yên kar re feyde ye. Eleqa te hem ji bo te û hem jî ji bo cîhê karê te ferq dike û ji bo Handels weke rêxistina sendîkayê û ji bo civatê bi giştî.**

Serpêhatina Handels durrûdirêj di beşa te de heye, ew dizane pêwîstiya te bi xwe û ya hevalên te yên kar bi çi heye. Pirsên te yên di derbarê karî yan jî jiyana kar de hebin, tu hertim dikarî bi hin kesên Handels re peywendî deynî. Dibe ku di derbarê mûçe de yan jî tûşbûna qezayek kar de be, heta bi tu hîs bikî tu têtî acizkirin, xetera jikarderxistinê yan nakokiyên bi şefî re.

## **Bê peyman-nepîştrast**

Kompeyman dikare li gor biryarên ku sendîka û kardêr li ser lihev hatine, bête guncandin ku di beşê de pêk bê. Heke kompeyman tunebe, biryarên kardêr derbas dibin. Wê çaxê kardêr dikare li gor serê xwe biryar bide, sîgorta û heqê dema zêde biavêje paşguhê xwe.

## **Mercên rewa**

Ji ber ku peyman ji bo gelek kesan e, komek e, bi kompeymanê dihê binavkirin. Li ser bingeha ku tev amadene û endam in. Wê çaxê Handels mafdar e ku li ser kîjan mûçe û mercên kar ku dê di beşê de derbas bibin, mercan deyne ber kardêrî.

## **Bi kompeymanê lihevhatin hene li ser:**

- Mûçeyê herî kêr dikare bête dayin. Lê ji bo ku kardêr mûçeyê zêde bide te, tu asteng jê re tune.
- Di dema karpêdanê û ji kar derxistinê de çi ne ku derbas dibin.
- Tu dê di dema karê zêde û karê dema naxoş de çi heqî bistîni.
- Dema karî dê çawan bête hesab kirin û serf kirin.
- Kengê mafê te yê valabûna biheq, ku jê re dibêjin îzin heye.

## **Jibilî van kompeyman dide te:**

- Teqawîdiya bilind.
- Sîgortayên di dema nexweşiyên, mirin, bêkarî û ku tu li ser karî xwe birîndar bikî de.

## **Em tiştên baş dikin lê em dikarin herdem baştir bibin.**

Silqî serê te û hemû kes ên dî ku bi Handels re ne, em dikarin vê bikin. Ji bo ku tu û hevalên te ên kar, bi rastî hemû branş, bikaribe mercên baş ên kar û mûçeyên baş werbigre, divê em gelek bin li piştê şertan. Endametiya te ferqê dike.



Martin,  
Kirêkar  
a embarê

## 10 sebebên endametiya Handels

01. Mûçeyên rewa û mercên pêbawer li ser kar.
02. Alîkarî ji bo wergirtina mûçeyê rewa û heq.
03. Heq ji bo karê di dema bêwext de.
04. Hinek kesên haydar in ku çî pêwîste û dikarin bi kardêrî re bixifin.
05. Alîkariya hiqûqî û rênîsandana di pirsên ku di derbarê karî û parastina me ya hiqûqî de ne.
06. Jîngeheke baştirîn.
07. Perwerdekirina endam di derheqa mûçe û mafan de.
08. Sîgorteyên qenc ji bo endaman wekî ya mal û qezayan.
09. Dayina peran di dema grev û lokawtê de.
10. Sîgortekirina hatinê ya me ku ji bilî kasa bêkariyê, dikare mûçeyê te di dema bêkariyê de biparêze.

## Kassa me ya bêkariyê

Ji bo çî nebî endamê kassa bêkariyê li Handels jî? Heke tu bibî bêkar ew piştrastiyê girîng dide te.

Tu dikarî zêdetir di derbarê endametiya û ku çî pêwîst e de li [handels.se](https://www.handels.se) bixwînin yan jî bi Handels Direkt (0771-666 444) re peywendî deynî.

**Niha tu bi rêya  
0771-666 444  
xwe digehînî  
Handels Direktê**

Li ba Handels Direktê şîretkariya şexsî derbarê pirsên endambûna te û kar û jiyana karî ji te re tîn pêşkêşk kirin. Ev pirs dikarin derbarê şertên kardariyê, meaş, jîngeha karî, maf û îmtiyazên endambûnê û heqê endambûna te bin.

Tu dikarî di rojên adetî de bi rêya 0771-666 444 têkilyê bi Handels Direktê danî, tu li kîjan cihê dijî.



Li vir tu dikarî bibî endam!

  
**Handelsanställadas förbund**

Handels Direkt 0771-666 444